

Daxuyanî ji hêla Mîr Tehsîn Beg, Mîrê Êzîdiyan li Îraqê û li cîhanê giştî

DAXUYANÎ

Em, endamên Civata Rûhanî ya Êzîdiyan li Îraqê û cîhanê hemî, tevî serokê vê Civatê û komîta wan ya şîrekariyê, wê mirovkujiya ku bi destên çend xortên nezan û bêmejî di 07. Nîsanê.2007`an de li gundê Behzanî çê bûbû, şermezar û rûreş dikin û li dij radiwestin. Wan ji nezani û cahiltiya xwe û ji nenasîna kelepûrên êlî (eşîrtî) keçeke Êzîdî bi şeweyekî hovîti kuştin. Ew keça cangorî hîç girêdana wê bi Îsalmê ve tune bû û her wiha ne weke axiftin û gotegotên belavbûne. Lê hindêk aliyên xêrnexwaz û gelac û nijadperest li xirabûnê digeriyan û dixwestin di navbera me û birayên me yê misilman de û bi navê ol û dîn neqencî û nebaşiyê belav bikin, agir bêtir gurr bikin. Ewan dixwestin ji kîsê gel armancên xwe yê bi qirrêj pêk bînin. Lê em dibêjin wan nemerdan ku dawîya her hewlek ji aliyê wan ve dê tim petax û hilweşandin be. Ew cudakirdina olî ji hêla wan ve tucar naçe serî û dê bi ser nekeve, jiberku em gelê welatekî ne, mina bira ne û her û tim em di şîr û şahiyên hevdu de bûn û di demên tarî de me destên hev kirtiye.



Ola Êzîdîtiyê, ya ku oleke “Yekxwedayî” ye û zorê û zordestiyê şermezar dike, dê çawa kuştin û mirovkuştinê qebûl bike û destûra vî karê nemerd û nebaş bide. Ew karê bi hovîti û zirçoneyî dûrî kelepûrên vê olê ne û ne ji rabûn û rûniştina gelê me ye.

Di pîrr Qewl û Nîzayên me yê pîroz de hatiye ser zimên, ku “ Jiyan bi destê Xwedê ye û standina rih û can jî dê bi destê wî be û ji mafê wî be”.

Em bangî wekheviya fermî dikin, ku vê pîrsgirêkê bi rengekî wekhevî û bê dilxwaziya aliyekî çareser bike. Em li dijî wan mirovan radiwestin, yê ku dixazin biratiya ol û baweriyên Kurdistanê û Îraqê helweşînin. Rabûn û rûniştina Êzîdiyan di demên bûrî de didine xuya kirin, ku ew tucar ji çarçûfeya çandî derneketine û her û tim rûmet dane û didane kultûr û olên din û bi rengekî biratî, wekhevî û aştxwaz cîrantiya gelên dora xwe kirine. Bêguman ramanên niştimanperwerî ev rabûn û rûniştin rehîkir û hêz dayê.

Em nerazîbûna xwe li ser vê mirovkujiya bi hovîti tînin ser zimên û kûr û dûr şermezar dikin. Di eynî çax de em banga xwe digihînin hemû mirovên ji ol û baweriyên din, ku destên xwe bidine hev, daku em hemû bikanîbin bi yek destî û bi yek devî li hemberî ruyên wan mirovên şerxwaz, mêldarîkar, gellac û armancxirab rabin.

Nîşanek ji nîşanên karê wan yê genî û bi qirrêj, ew kuştina 24 karkerên Êzîdiyên bê guneh di 22.04.2007`an de bû, yê ku bi dehsalan di karistana tevin û çêkirina caw de li bajarê Mûsilê kar dikirin. Wan ew karker kuştin bi tenê jiberku ew Êzîdî bûn. Ev mirovên nemerd û xêrnexwaz mihawelên xwe didomînin, jiboku di navbera gel û olên wî de şerr û birakujî peyda bibe û jiberku ew berî hingî, li gel ku pîrr propaganda delreşiyê û dexis û buxdê kirin jî lê nigihîştin wan armancan.

Em mirovin xêrxwaz in, ne şerrxwaz in. Daxwaziya me jiyana bi aşî û bi biratî li gel gelên e. Em hemû, weke Qewlên me yê pîroz dibêjin, xwedêperest in û di eynî kat de jî bira ne.

Xwedê xêrê li ser me giştan bibarîne û şerran ji ser me wergerîne û hemû di xêr û xweşiya welat û yekîtiya gel de bimîne .

Tehsî Se`îd Ali

Mîrê Êzîdiyan li Îraqê û cîhanê û serokê Civata Rûhanî ya bilind.

27. Nîsanê 2007